Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1272 | 11-Gulan-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Girê Leylên axa dewlemend



**Roheyv Keleş/ Qamişlo**

**Girê Leylên yê xwedî erda zengîn û xwezaya balkêş li Rojhilatê deşta Xabûrê ye û bi kombûna çemê cerahê, soplaxê û qetranê ev gund ava bû, li ser destê kurdên hûrî di hezar sala 4'emîn de berî zayînê.**

Bi hezaran gund,Gir, perestgeh û bajarên kevnar li ser axa dewlemend ya Kevana Zêrîn di navbera rêzeçiyayên Kurdistanê de li deşt û kêleka rûbarên Firat, Xabûr û Dîcleyê hatibûn avakirin. Yek ji wan jî Girê leylên e.

Koka gundê girê leylên vedigere serdemên kevnar, ji ber ku şahidiya derbasbûna gelek şaristaniyên ku li her quncikek gund şopa xwe hiştine, ji bermahiyên kevnar heta mîmariya kevneşopî. Girê Leylên çîrokên ji dîroka xwe ya kevnar vedibêje.

Li kêleka wê jî xwezaya spehî ya ku dora wê girtiye heye. Ew cihekî aramiyê ye û erdekî hêjayî serdanê ye ku mirov ji bedewiya wê û xweşikiya wê ya dîrokî sûd werbigire.

**Cihê wê yê erdnîgarî û sedema navlêkirina wê**

Girê Leylên li parçeyê rojhilat yê herêma Xabûr dikeve, nêzî newala Cerah ya girava jorîn. Ev gir dikeve 28 km başûrî rojhilatî bajarê Qamişlo û 82 km bakurî rojhilatî bajarê Hesekê. Ev gir bi gelek navan hatiye naskirin, navê wê yê kevin Şexna bû wê çaxê paytexta welatê Abûm bû yê ku di arşîva Marî (Tel EL-Herîr) û tablêtên mîxî de yên di Girê Leylên dorpêçkirî bûn hatibû gotin. Di sedsala 19'an b.z ev bajar ji aliyê Asûryan ve hat dagirkirin û navê wê bû Şebit Enlîl (nişîngeha Enlîlê xwedawend). Piştî mirina şah Şemşî Aded navê wê yê berê (Şexna) ji nû ve lê vegeriya, Girê leylên yek ji girên herî mezin yên şûnwarî û yek ji gund û niştecihbûnên kevintirîn ên li Sûrî, şûnwariyên yekemîn vedigere dawiya hezarsala şeşan B.Z.

**Girê Leylên ji bajarên girîngtirîn li bakurê Mezopotamyayê ye**

Girê Leylên ji bajarên girîngtirîn li bakurê Mezopotamyayê di nava hezarsala 2 û 3'an B.Z'ê de. Ev sedema wê vedigere ku ev giraya li ser riyeke bazirganî ya ku dikeve herêmên bakurê beravên Deryaya Spî û Mezopotamyayê û Bajarê Xatî bi hev re girê dide. Ev giraya ji du herêman an ji du parçeyan pêk tê, herêma jorîn Akropolîs ev herêm kevintirîn e û devera nizm a ku parçeyê jorîn radipêçe navê Lower Town e, bi giştî rûbera gir dighêje 90 hiktarî. Vî girî ji nîvê hezar sala 3'an B.z zêdebûnek ber bi çav di qewara nişteçihbûnê de dît. Ji ber vê yekê ew gundê biçûk dageriya qewara bajarekî ta ku rûbera wê gihaşt 90 hiktarî. Di warê rêxistinbûna wê ya ramyarî an siyasî û aborî de pêşket û bû ji navendên girîng û stratîjîk di herêma Xabûr de û di vê demê de navê bajêr bû Şexna. Di dawiya hezarsala 3'an B.z de bajar di bin desthilatdariya Ekadan de bû û piştre ket bin desthilatdariya Asûriyan. Di nîvê hezarsala 2'an de ji zayînê re Şexna bû parçeyek ji Împeratoriya Hûrî-Mîtanî mîna hemû herêmên Xabûr a ku nuqteya rasteqîna wê ji wan herêman bû.

**Lêkolînên li ser hatine kirin**

Di gelek deverên cur bi cur de ji bajarê nizm a Gir gorên esîlzadeyên Mîtanî yên vedigerin vê serdemê hatin dîtin. Her wiha xilik û dîzikên yên pirreng û şûnwarî yên nûnertiya vê serdemê dikin jî hatin dîtin. Lêkolîn: Sazkariyên lêkolînê di gir de sala 1979'an de ji aliyê zanîngeha (Yale University) bi rêbertiya zanistvanê şûnwaran Harvey Weiss dest pê kir. Di riya têst, rûbergirtin û lêkolînên li gelek cîwarên gir. Ev lêkolîn sera, perestgeh, avahî, depo, xilik û dîzikên ku vedigerin qonaxên cuda derpêç kir. Perestgeh bi berê xwe yê ku ji heriyê hatiye avakirin ciyawaz e, ev ber ji dengeyên ber hev û kenderên (avder) ku stûnên nexşî bi awayekî pêçelpêç mîna qurmê dara xurma, ku ji vê tê diyarkirin bandoriya başûrê Mezopotamyayê (Somer) bi awayekî zelal. Seraya vedigere Qarni lim li aliyê bakur ji parçeyê nizim ê gir hat dîtin. 1251 têbilêtên bi nivîsandina mîxî bi zaravayê başûrî ji Babiliya kevin hat derpêçkirin. Di wan tabilêtan de mijarên derbarê deqên rêveberî, nameyên padîşahî, peymanên navnetewî, karûbarên olî û mijarên aborî yên amadekirin xweşava Bîra û vexwarina wê, hatin gotûbêjkirin. Muhrek stonî li gel çapa muhran vedigere dawiya hezarsala 3'an B.Z.

## Li Kobanê hilberîn û çandiniya bi destê jinê

**Navenda Nûçeyan**


Li taxa Kaniya Kurdan a Kobanê, jin hem bistanan diçînin û hem jî karê lawirvaniyê dikin. Ew bi wê yekê debara jiyana xwe dikin.

Li Kobanê, bi taybetî li taxa Kaniya Kurdan ku bi xweza û çandiniya xwe tê naskirin, dayîk bistanên salane amade dikin. Di werza Havînê de bistanên havînê, firingî, bacanê reş, îsot, kundir, xiyar, xitiyan, fasûlî û hwd. diçînin. Zivistanê jî tivir, pîvaz, sîr, silk, sebanix, bexdûnis û reşad tê çandin.

Li Kobanê bêhtir çandiniya bistanan û bi taybetî zebzeyan ji Kaniya Kurdan ew berhem tên derxistin. Bi taybetî jî berhemên çandiniyê yên dayikan e. Li wir hem dayîk bistanan diçînin û hem jî lawiran xwedî dikin. Lawirên weke pez û çêlek lê tê xwedîkirin û mast, penêr û gewrahî beşeke mezin dide bajêr.

Xalîde Mihyedîn ku niha bistanê Xasan çandiye û di heman wextê de kundirên xwe heke dike dibêje ku yek ji tiştên sereke ku ew li Kaniya Kurdan dikin çandinî ye û wiha pêde diçe: "Em niha dest bi firotina xesan dikin. Beriya çandiniya her berhemê em ewil li wir cot dikin. Piştî wê em şitlên xwe diçînin, piştî mehekê ji çandiniyê em dikin. Dûre jî em gubre û av dikin."

Xalîde Mihyedîn anî ziman ku ew bû şeş sal in karê çandiniya bistanan dike û dibêje îsal ji ber kêmbarîna baranê, berhem gelekî kêm e. Xalîde Mihyedîn got, "Ji ber sermayê û kêmbarîna baranê, pir xes nayê çandin. Em jî weke dayîk barekî dixin ser milê xwe da ku bi destên xwe wan bistanan biçînin. Ev jî bû du sal in ku em petatan jî diçînin û em wan berhemên xwe jî difiroşin. Jin dikare her tiştî bike, ez dikarim hem bistanan biçînim û hem jî debara mala xwe bi giştî bikim."



### Sudoku: Bersiv 39

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 6 | 8 | 1 | 2 | 9 | 5 | 7 | 3 |
| 5 | 1 | 2 | 7 | 6 | 3 | 4 | 8 | 9 |
| 3 | 7 | 9 | 8 | 4 | 5 | 6 | 1 | 2 |
| 1 | 3 | 4 | 2 | 5 | 7 | 8 | 9 | 6 |
| 6 | 8 | 7 | 4 | 9 | 1 | 3 | 2 | 5 |
| 2 | 9 | 5 | 6 | 3 | 8 | 7 | 4 | 1 |
| 8 | 4 | 3 | 5 | 1 | 2 | 9 | 6 | 7 |
| 9 | 2 | 6 | 3 | 7 | 4 | 1 | 5 | 8 |
| 7 | 5 | 1 | 9 | 8 | 6 | 2 | 3 | 4 |

### Sudoku:Pirs 40

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 5 | | 8 | 3 | | | |
| | | | | | | 4 | | 2 |
| | 1 | 9 | | | 4 | | | 5 |
| 9 | | 4 | | | 7 | | 1 | |
| 1 | | | 4 | | 9 | | | 8 |
| | 3 | | 8 | | | 9 | | 6 |
| 3 | | | 1 | | | 7 | 8 | |
| 5 | | 1 | | | | | | |
| | | | 6 | 4 | | 3 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Derzî li erdê bikeve çingîniya wê dibihîze:**
-Haya wî ji her tiştî heye; guhdîk e; jîr e; jêhatî ye.

**Derzî li erdê bikeve dengê wê dibihîze:**
- Bi heman wateyê.

**Di ber re qajikê xwe jî dicû/dikare di ber e qajikê xwe jî biçû:**
- Ji bo wî pir hêsan e; jê re ne pirsgirêk e; bi hêsanî dikare bike.

Dikare gepa xwe ji devê gur derxe;
- Xwe ji gelek davikan rizgar kiriye; gelek teşqele hatine serê wî; mirovekî pir bitecrûbe ye; zûbizû nayê xapandin.

**Dikare gepa xwe ji tehtê derxe:**
- Bi heman wateyê.

**Dikare şeytan ji rê derxe:**
- Bifen e; jîr e; jêhatî ye.

**Dinyayê li ser tiliya xwe dizîvirîne:**
- Pir jîr û jêhatîye; ti kes nikare bixapîne.

**Di ti gêran de naxeniqe:**
- Pir jîr e; xwe ji her pirsgirêkê rizgar dike; ti caran tiştek nayê serê wî.

**Di xapan de du sed ders dane Iblîs:**
- Pir jîr e; fenek e; ti kes nikare bixapîne.

**Du mû di nava çavên şeytên de çandine:**
- Pir jîr e, pir jêhatî ye, ti kes nikare bixapîne.

**Dûvên wan li hev pêçayî ne/dûvên wan li hev badayî ne:**
- Zû bi zû nayên naskirin; fenên wan pir in; têkiliyên wan pir kûr in.

**Dûvê xwe di pir tepikan de qurçandiye:**
- Xwe ji gelek davikan rizgar kiriye; gelek teşqele hatine serê wî; mirovekî pir bitecrûbe ye; zûbizû nayê xapandin.

**Ew jî ne hindik e:**
- Ew jî têra xwe heye; ji heq xwe derdikeve; ne feqîr e.
- Dikare bersiva xwe bide; jêhatî ye; zana ye.

**Ez dizanim ka çend rûvî di zikê wî de hene:**
- Ez wî pir baş nas dikim; ez bi hîlebaziya wî dizanim.

**Fenan li şeytên dike:**
- Keysbaz e; jîr e; jêhatî ye; nayê xapandin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Hozan Mizgîn bi hunera xwe bandoreke mezin li jinan kir



Şoreşger Hozan Mizgîn bi berxwedan û têkoşîna xwe bandorek mezin li ser jinan kir. Stranên wê yên şoreşê hîn jî ji hêla bi hezarên kesan ve têne gotin û guhdarîkirin. Wê her tim digot ku ew li ser şopa stranbêja Kurd Ayşe Şan ku li dijî bendên civakî yên li ser jinan dihatin ferzkirin, têkoşiya.**R-7**

## 'An Sûriyeke demokratîk an jî şerekî navxweyî yê bêdawî'

Rojnamevan Idrîs Henan diyar kir ku lidarxistina Konferansa Kurdî ji bo tevahî Sûriyê giring e û wiha got: "Lidarxistina konferansa yekrêziya Kurdî weke şertekî parastina yekrêziya ax û civaka Sûriyê ye. Îro jî bi yekrêziya xwe, bi rola xwe ya pêşengtiya dîrokî ya avakirina Sûriyeke azad û demokratîk radibe." **R-5**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1272 | 11-Gulan-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S




## Şehîd Leyla Qasim.. sembola jina Kurd a wêrek e

Jina Kurd a serhildêr Leyla Qasim weke bi hezarên jinên Kurd çavên xwe li ser hezkirina Kurdistanê vekir, ji bo doza gelê xwe ruh û can feda kir, ew bû sembola berxwedanê li hember hovtirîn sîstemên nijadperest.**R-2**

# PLANÊN TIRKIYÊ LI BENDAVA ŞEHÎDAN TÊK ÇÛ

Berxwedana şervanên azadiyê û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ya li Bendava Şehîdan destkeftiyên Şoreşa 19'ê Tîrmehê ku bi saya fedakariyê hatine bidestxistin, misoger kir. Piştî berxwedana bêhempa ku 118 rojan dewam kir, planên dagirkeriyê û hisabên wê yên dagirkirina tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, têk çûn. Berxwedan bi serkeftinê tacîdar bû û Bendava Tişrînê veguherî bendava berxwedan û şehîdan, bû mînaka hevgirtin û yekrêziya gelan. Herwiha bû nemûneya zindî ya hêza gelên Neteweya Demokratîk.**R-3**





## Zêdeyî milyonek kes li benda ava Elokê ne

6 sal in ku şîneyên Hesekê û gundewarên wê rastî kirîza avê tên, dagirkeriya Tirk bi rêbazê şerê tîkirinê bi siyaseteke qirêj ava Elok li ser milyonke û 200 hezar kesî ji 4'ê Cotmeha 2023'yan ve qut kiriye.**R-6**



## Xweparastin navê vê pêvajoyê ye

Pergala ku li ser jirêderxistina her tiştî ji cewher û hebûna wê hatibe avakirin.. Gelo dikare cewherê feraseta xweparastinê di civakê de mayînde bihêle? Ger Rêber Abdullah Ocalan ev pêvajo bi "Xweparastinê" pênase kiriye, wê demê em ê giringiya xweparastina cewherî di avakirina civakeke ku li hember hemû diyarde, zihniyet û pevçûnan xwe biparêze, têbighêjin.**R-7**



**Kes baweriyê bi desthilata li Şamê nake!**
Mihemed Seydi R-4



**Hevkariya bi Rojava re misogeriya demokrasiyê ye**
Idrîs Henan R-5



**Hevgirtin**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# ‘Rola jinên DAIŞ’ê di rêxistinkirina şaneyan de diyar e û yên ku dixwazin dur bikevin tên kuştin’

Rêveberiya Giştî a Hêzên Ewlekariya Hundirîn Jin ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Dîler Hesen da zanîn ku di oparasyonên ewlekariyê ya li Kampa Holê de gelek jin hatin girtin û radestî welatên wan bûn û got “Rola jinên DAIŞ’ê di rêxistinkirina şaneyan de diyarker e û zarokên ku mezin dibin li ser zihniyetê olî û tundiyê terbiye dibin”.

**Zana Roj/Qamişlo**

**- Li hember şaneyên DAIŞ’ê gelek oparasyon hatin destpêkirin. Bi taybet çi rola jinên DAÎŞ’ê di rêxistinkirina van şaneyan de heye?**



Ger em bixwazin mijara DAIŞ‘ê bi taybet di hundirê Bakur û Rojhilatê Sûriyê de binirxînin divê em behsa her du Kampên Hol û Roj bikin, ji ber di navbera 2015 heyanî 2016’an her du kamp ji bo DAIŞ û malbatên wan hatin avakirin û gelek malbatên wan tevî zarokan di nava xwe de dihewîne. Di hundir kampan de gelek nasname û netew hene ku ji 54 nasnameyên ji cîhanê, di wir de hene. Bi taybet Kampa Roj giştî kesên biyanî ne ku ji Rojhilata Navîn, Asya, Ewropayê û Çînê hene.
Bi taybet mijara şaneyên DAŞI’ê helbet gelek oparasyonên ewlekariyê bi destpêka rizgarkirina herêmê û avakirina Kampan re hatin orgenîzekirin. Ji derveyî rola hêzên ewlekariyê di hundir her du kampan de bi giştî 5 oparasyonên berfireh hatin destpêkirin. Ev oparasyon ji bo pêşîgirtina li ber tevgerên veşartî yên ku dixwastin rêxistin bikin û pêk bînin hatin kirin. ji ber di demekê de dixwastin têkilî ji derve de bi wan re bê kirin. Bi tayebt piştî hilweşandina rêjma Baas xwestin di Badiyê de xwebirêxistin û tevbiger bikin. Her wiha dest avêtin gelek cihan, bi taybet xwestin êrişî bendên me yên kontrolê li Tepqa, Reqa, Dêrezor û herêmên Cizîrê bikin di heman demên de xwestin êrişên xwe di nava bajaran de xurt bikin. Lê Hêzên Ewlekariya Hundirîn li pêşiya vê girtin.
Li Kampa Roj bi tayebt oparasyonek ji aliyê Hêzên Ewlekariyê yên Jin ve hate destpêkirin. Her wiha gelek kes hatin girtin. Di wan oparasyonan de gelek şêwaz, teknîk, hewldan û xebatên xwebirêxistinkirin û êrişan hatin derketin. Gelek çek, qebde û alavên din hatin dîtin. Her wiha tunel amede dikirin, da ku birevin û xwe bighînin herêmên derveyî Rêveberiya xweser. Di giştî de roleke sereke a jinên DAIŞ’ê di rêxistinkirina şane û êrişan de heye. Ev yek jî di oparasyon û çavdêriya me de hate zelalkirin.



**- Ji ber jin zarokan mezin dikin dikin, di kampê de zarok li ser zihniyteke çawa dihatin mezinkirin?**

Belê; Dema em di dîmen, nûçe û malperan de dibînin ku çawa zarokên di kampan de xwedî hêrs û kînekê ne ku bi tu awayî naşibin rihê zarokatiyê. Ev yek rastiyeke û di kampan de tê dîtin. Jinên DAIŞ’ê zarokên xwe li ser bingeha zihniyeta DAIŞ, olî, jirêderketî û bi kîn û nefret tên mezinkirin. Di serê wan de hatiye çandin ku her kesek derveyî kampê kafir in û divê bên serjêkirin û nabê kes nêzî wan bibe. Ji bo wan zarokan wiha perwerde û mezin bikin, ev yek heyanî bi riya çîkirina leystûkên destê wan de dihate perwerdekirin ku hemû leystûkên wan nîşaneya qetilkirin û tundiyê bûn.
Em dikarin bêjin ku hîn qutkirinek di navber DAIŞ û Kampê de nehatiye çêkirin. Hêj jî li wir zarok bi zihniyeta DAIŞ’ê tên mezinkirin. Ew cilên wan yên reş li ser mejiyê wan jî serwer e û naxwazin xwe jê rizgarbikin. Bi taybet jinên ku dixwazin xwe ji wê zihniyetê ji wê qefesê rizgar bikin, ew jin tê kuştin. Bi sedan jin bi dehan zarok bi vê tewanê hatine kuştin û tunekirin.

**- Gelo di operasyonên ku we dane despêkirin de çiqas jin hatin girtin? Û xebatên ku we di wir de kirine ji bo pêşîgirtina li hember vê zihniyetê çi ne?**

Di Mijara girtina jinan de gelek xebatên pêşîgirtinê hatin kirin. Jinên ku têne girtin radestî welatên wan dibin. Bi riya rêveberiya Kampê û Desteya Têkiliyên Derve re ev yek pêk tê, heyanî niha jî gelek jin ji bo welatên wan hatin şandin.
Xebatên oparasyonê di herêm û kampan de wê her tim berdewam be. Ji ber dem dem em dibînin ku hewldanên pêkanîna êriş û xwerêxistinkirinê pêk tên. Di hundir kapan de Hêzên Ewlekariya Hundirîn 24 saetan li ser erk û tevgerê de ne, bi alîkariya Hêzên QSD’ê û YPJ’ê oprasyonên ewlehiyê bi hev re pêk tînin. Her wiha bendên kontrolê a her bajarî li ser vê mijarê bi tayebt baldar in. Ev oparasyonên ewlekariyê ji bo ewlekariya hemû herêm û cîhanê tê pêk anîn. Bi tayebt ji bo parastina herêmê ji êrişên derve û hundir her wiha ji bo parastina nirxên Şoreşa Rojava û a jin.

# Şehîd Leyla Qasim.. sembola jina Kurd a wêrek e

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Jina Kurd a serhildêr Leyla Qasim weke bi hezarên jinên Kurd çavên xwe li ser hezkirina Kurdistanê vekir, ji bo doza gelê xwe ruh û can feda kir, ew bû sembola berxwedanê li hember hovtirîn sîstemên nijadperest.**

51 sal li ser şehadeta Leyla Qsim û hevalên wê derbas dibe ku li ser destê rêjîma Baas ya Îraqê hatin darvekirin. Leyla Qasim di 29’ê Nîsana 1974’an li Bexdayê hate girtin û di 12’ê Gulana 1974’an hate darvekirin. Ew berî darvekrinê rastî îşkenceya derûnî û fîzîkî di zindanên rêjîmê Baasê a Iraqê de hat.

**Kurte jiyana Şehîd Leyla Qasim**

Şehîd Leyla Qasim sala 1952’an li gundê Bamîlê yê Xaneqînê li Başûrê Kurdistanê ji dayîk bû, di nava malbateke kurdperwer de mezin bû. Di sala 1958’an de dest bi xwendina xwe kir û qûnaxa seretayî û navendî li Xaneqînê bi dawî kir.
Leyla Qasim di sala 1971’an derbasî beşa civaksaniyê fakulteya Wêjeyî ya zanîngeha Bexdayê bû û di heman salê de di Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê de xebat da meşandin. Têkoşîna xwe di nava Partiya Demokratîk a Kurdistanê PDK destpê kir, gelek çakaliyên siyasî li dijî zilma hikumeta Baas a Îqarê pêk anî.

**Girtina Leyla Qasim û hevalên wê**

Piştî hilweşandina peymana 11’ê Adara 1970’ê ya navbera hikumeta Iraqê û Mela Mistefa Barzanî ku li gorî wê hikumetê hebûna kurdan qebûl dikir, tevahî hevalên wê yên partiyê neçar man ji Bexdayê derkevin. Leyla biryarê dide ku li wir bimîne û têkoşîna xwe ya li dijî rejîma dîktator bidomîne. Pê re hewl da têkiliyê bi hevalên xwe re çêke da partiyê ji nû ve dûrî çavên saziyên ewlehiyê bi rêxistin bike. Di Şeva 24’ê Nîsana 1974’an de hêzên rejîma Baasê, mala Leyla dorpêç kir û ew girtin. Leyla Qasim û hevalên wê di girtîgehê de rastî gelek îşkence û tundiyê hatin, rêjîma Îraqê ji bo tirsandina kurdan bi taybet kategoriya rewşenbîran di demeke kurd nêzî 14-15 rojan, bi pêkanîna dadgeheke fermî her pênc têkoşerên kurd bi darvekirinê mehkum kirin.

**Leyla rastî her cure êşkenceya giran hat**

Leyla Qasim bi van gotinan bersiv da:
“Ez ne sûcdar im, ez têkoşerek im, ji bo doza xwe ya rewa; doza Kurdî kar dikim, di oxira vê dozê de, ez ê giyanê xwe feda bikin.”
Leyla di serdana bi malbata xwe re, cilekî Kurdî û tayek ji porê xwe qut dike û dide xwişka xwe da ku bibin şahidên têkoşîna wê.

**Leyla Qasim bû bûka Kurdistanê**

Leyla Qasim bi cilê Kurdî û xwendina sirûda netewî ‘Ey Reqîb’ diçe ber sêderê û di dawiya kêliyên jiyana xwe ji celadên Bass’ê re wiha dibêje: “Piştî bidarvekirina min, bi hezaran kurd hişyar dibin. Gelek xweşhal û serbilind im ku giyana min fedayê riya rizgariya kurdistanê dikim.”
Leyla Qasim dibêje: “Bi vî cilê kurdî ve, ez dibim bûka Kurdistanê.”
Roja 12’ê gulana 1974’an Leyla Qasim û 4 hevalên xwe Cewad



Hemewendî, Narîman Fûad, Hesen Hemereşîd û Azad Silêman hatn bidarvekirin.
Di roja duyemîn a darevkirinê laşê Leyla Qasim teslîmî malbata wê kirin, li bajarê Necif li girîstana “Wadî el Selam” dûrî welat û cihê zaroktiya wê hate veşartin.
Li ser şopa wê bi sedan jin, navê wê rakirin û berxwedan û têkoşîna wê didomînin.



# Hozan Mizgîn bi hunera xwe bandoreke mezin li jinan kir

Şoreşger Hozan Mizgîn bi berxwedan û têkoşîna xwe bandorek mezin li ser jinan kir. Stranên wê yên şoreşê hîn jî ji hêla bi hezarên kesan ve têne gotin û guhdarîkirin. Wê her tim digot ku ew li ser şopa stranbêja Kurd Ayşe Şan ku li dijî bendên civakî yên li ser jinan dihatin ferzkirin, têkoşiya.

**Amara Baran/ Qamişlo**

33 saliya koça dawî ya Hozan Mizgîn (Gurbet Aydın) e, ku bi xeta hunera şoreşgerî ya ku temsîl dikir nûnerê kevneşopiyeke girîng bû. Hozan Mizgîn di sala 1962’an de li Êlihê ji dayik bû, demek kurt beriya darbeya 1980’î tevlî Tevgera Azadiya Kurd bû. Mizgîn, ku di sala 1983an de ji bo rêxistinkirin û pêşxistina hunerê li Ewropayê gelek hewl da, beşdarî damezrandina Hunerkomê bû. Mizgîn piştre berê xwe da çiyayan û di 11’ê Gulana 1992’an de li Tetwanê di şerekî de jiyana xwe ji dest da. Her çend 33 sal di ser şahadeta wî re derbas bûn jî, stranên wî, bi taybetî ‘Lo Hevalo’ û ‘Hawar Gundîno’, hîn jî têne behskirin. Hozan Mizgîn li ser şopa hunermendekê dimeşe ku mîna xwe li dijî rolên ku ji jinan re hatine destnîşankirin şer dike, guh dide stranên wê û dibêje. Mizgîn a ku bi awaz û awazên Ayşe Şanê distirê, bi stranên Hozan Serhad wek “Mizgîna çeleng, xwedî nav û deng” di bîranînan de maye.

**Bandora xwe li ser herkesê çêkir**

Hozan Mizgîn bi Hozan Sefkan re hîmê Koma Berxwedan ava dike. Bi Koma muzîkê gelek stranên gelêrî tomar dikin. Hozan Mizgîn, ku li Ewropayê pêşengiya çalakiyên çandî û hunerî yên Kurdî dikir, bi stranên xwe yên “Lo Hevalno” û “Hawar Gundîno” di nav gelê Kurd de popîler bû. Stranên wê bandor li gelek kesan kirin. Di wê demê de, Hozan Mizgîn çalakiyên Tevgera Azadiya Kurd jî dikir. Lêbelê, Hozan Mizgîn her tim dixwest biçe çiyayan û tevlî têkoşîna çekdarî bibe ji ber ku wê pir baş dizanibû ku divê gelê Kurd ji bo pêkanîna hunera azad welatekî azad hebe.

**Stranên wê ji aliyê Dewleta Tirk ve hatin qedexekirin**

Piştî ku Hozan Mizgîn dest bi çalakiyên xwe yên çandî û hunerî li Ewropayê kir, wî hem hunera şoreşgerî û neteweyî ya Kurdistanê bi koman pêş xist û hem jî gelek berhemên nemir ên wekî ‘Çemê Hêzil’, ‘Lo Hevalo’ û ‘Gundîno Hawar’ hilberandin. Ev berhemên hunerî yên Hozan Mizgîn û avakirina komên muzîkê bûn yek ji wan materyalên ku propagandaya şoreşê zêde kirin. Stranên wî ji aliyê dewleta Tirk ve hatin qedexekirin, ji ber ku ew bi Kurdî bûn û li ser bingeha şoreşê bûn. Lê belê,




raya giştî bi dizî guhdarî kasetên qedexekirî yên Hozan Mizgîn dikir.

**Ne tenê hunermend bû, di heman demê de fermandar bû**

Hozan Mizgîn di perwerdehiya îdeolojîk re derbas dibe. Ew ne tenê hunermendek e, lê di heman demê de fermandarek e, dema ku dem tê şervanek e û ji bo azadiya Kurdistanê çi hewce be dike. Piştî vegera ji Ewropayê, Hozan Mizgîn li deverên Başûr û parêzgeha Merdînê xebatên rêxistinî dimeşîne. Bi helwesta xwe ya bi biryar û dilnizm, pir zû hezkirina gel qezenç dike. Girseyan birêxistin dike û têkiliyên berfireh û serkeftî ava dike. Hozan Mizgîn, ku di nav hevalên xwe de jî pir populer e, ji ber bandora xwe ya mezin li ser gel, dibe hedefa dijmin. Hunermendê şoreşger û fermandarê efsanewî di encama berxwedaneke mezin de li Tetwanê şehîd dikeve. Bi hezaran zarokên Kurd ên ku bi deng û muzîka Hozan Mizgîn mezin bûn, îro jî mîna wî li çiya û bajaran bi ruh û coşa ku ji hêla muzîka wî ve hatiye afirandin şer dikin û li ber xwe didin.

**Rêber Apo: Ew jinek bû ku hêjayî PKK’ê bû**

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan derbarê kesayetî û helwesta Hozan Mizgîn de ev nirxandin kir:
“Ew jinek bû ku ji aliyê PKK’ê ve hatibû afirandin. Ew hevalek bû ku di temenê ciwan de tevlî me bû. Ew jinek hêjayî PKK’ê bû. Wê qet di derbarê şerkirina li ser xeta PKK’ê de dudiliyek nedît.”

**Berxwedan û têkoşîna wê bandorek mezin li ser jinan kir**

Hozan Mizgîn bi berxwedan û têkoşîna xwe bandorek mezin li ser jinan kir. Stranên wê yên şoreşê hîn jî ji hêla bi hezaran kesan ve têne gotin û guhdarîkirin. Wê her tim digot ku ew li ser şopa stranbêja Kurd Ayşe Şan, ku li dijî rolên civakî yên li ser jin û keçan dihatin ferzkirin, têkoşiya, şopandiye. mizgîn wekî” Berî her tiştî, ew şoreşgerek jin, hunermend, milîtana partiyê û gerîla bû. Wê her sê taybetmendî di kesayetiya xwe de temsîl kirin. Ev tê vê wateyê ku wê kesayetiyek bêkêmasî di rastiya xwe de temsîl kir. Ew nûnerê serdema herê bi êş a dîroka jinên kurd bû heman demê de şehrezaya êşê bû jî, êşa ku jinên kurd jiyan kirine zilim û zilma ku lê hatiye kirin, û dilsoziya wan a bi nirxên xwe, dilsoziya wan a bi zayend û civaka xwe re, di kesayetiya xwe de bi awayekî pir xurt temsîl kir.

# Keleha Sikera

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Keleha Sikera çîroka şaristaniyeke ku di demekê de li welat serdest bû vedibêje. Bermahiyên wê hê jî mane, ji nifşan re vedibêje ku dîrok di vir re derbas bûye.**

Keleha Sikera di navbera zozanên Çiyayê Kizwan “Ebdul Ezîz” de ye, ku bermahiyên wê dîroka Eyûbî tê dîtin. Ew saxlem ma, wekî çavê dewleta Eyûbî li ser rêya tekane ya vî çiyayî.
Keleha Sikera parêzgeheke biçûk e ku li yek ji rêzeçiyayên bilind ên Çiyayê Kizwanê ye, dikeve başûrê rojavayê Hesekê û bi qasî 35 km dûrî Hesekê ye. Di rêya Hesekê-Mexlûca ku li kêlek û binê girê ku bermahiyên vê kelehê lê hene, dimeşe. Keleh bi qasî 300 metre ji deştên derdorê bilindtire.
Ew keleheke kevnar e vedgere serdemên Eyûbî û Memlûkan. Ew tenê ji bo armancên leşkerî hate avakirin, wekî ku ji şêwaza mîmarî ya kelehê û şûşeyên fexar ku li seranserî banî belav bûne diyar e. Xuyabûna wê ya giştî diyar dike ku ew kelehek berevanî bû, rola wê bi îhtîmalek mezin ku xalek parastin û peydakirina artêşên îslamî bû.

**Avahiya kelehê ya mîmarî**

Dema ku mirov hildikşe derenceyên ku ber bi kelehê ve diçin û piştî ku bircên yekem û duyemîn derbas dibin, rastî birc û dîwarên ji kevirên kilsê hatine çêkirin tê. Dûrahiya qursên çêkirî di navbera 20-40 cm de ne û ne asayî ne. Tiştê ku di kelehê de tê dîtin bermahiyên çar bircan in, di nava bircan de qubeyeke ku li hundir bi xemlên geometrîkî bi şêweya islamî hatiye xemilandin tê dîtin, li qata zemînê ya birca duyemîn xuya dike. Bermahiyên sê bircên din bi giştî hilweşiyayî xuya dikin, tenê bingehên wan e ku bi zelalî nayên dîtin, Dîwar û laşên kelehê bi temamî xirab bûne, lewma tenê bingehên wan xuya dike.
Di nav qadeke 150 x 80 m2 de, hewşeke ji kevir a bi pênc bîrên dorveger, sê heta heşt metre kûr e, li başûrê rojhilatê hewşa kevir hatiye kolan; tê dîtin. Niha jî Tore li ser wan hatin danîn da ku tu kes jê nekeve.
Çiyayên Kezwanê dinêre, ji ber ku armanca sereke ya avakirina wê çavdêrîkirina deşta bakûrê çiya bû, herwiha kontrolkirina dergehê çiya ku ji bakur ber bi başûr ve dabeş dike. Xuyaye girêdayê deşta bakur û deşta başûr bû.

**Xebatên sererastkirinê**

Di Pûşbera 2009’an de keleh rastî xebatên sererastkirinê hat, di vê



xebatê de li ser xurtkirina hîmên bircên duyemîn, sêyem û çarem, herwiha danîna tevnek hesinî ji bo girtina bîrên hewşa kelehê û çandina daran li dora girê ku keleh xwe dispêrê bû. Wekî din ji binê kelehê de derenceyek ji bo hêsankirina gihîştina girê hate avakirin.
Bi dirêjahiya salan, keleh ji bo niştecihên herêmê wekî cihekî bêhin vedanê bû. Lê belê ew di deh salên borî de hate paşguh kirin. Ev yek bû sedem ku beşek ji çar birc, dîwar û bîrên kelehê ji ber rewşa hewayê wêran bibe û zirar lê hate kirin, herwiha komên çeteyan ziyanke mezin tê de çêkiribûn.
Di sala 2018’an de ji bo parastina vê şûnwarê arkeolojîk û dîrokî, Rêveberiya Şûnwar Tûrîzmê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Kantona Cizîrê ji bo vegerandina wê xebatên sererastkirinê da meşandin, da ku deriyê xwe ji nû ve li hember şêniyan vebike.

# Zêdeyî milyonek kes li benda ava Elokê ne

6 sal in ku şîneyên Hesekê û gundewarên wê rastî kirîza avê tên, dagirkeriya Tirk bi rêbazê şerê tîkirinê bi siyaseteke qirêj ava Elok li ser milyonke û 200 hezar kesî ji 4'ê Cotmeha 2023'yan ve qut kiriye.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Qutbûyîna ava Elokê ya ku dibe jêdereke tekane ji bo şîneyên Hesekê mijareke dijmirovî ye ku ji hêla dagirkeriyê ve tê kirin. Stasiyona Elokê xwedî cihekî stratîjîk e, lewma bi sedema cih û girîngiya xwe ji bo şîneyên Hesekê û gundewarên wê bû sedema ku çavê dagirkeriyê lê sor bibe.



**Cih, dîrok û girîngiya istratejîk a Stasiyona Elok**

Stasyona avê ya Elok 10 km dûrî rojhilatê bajarê Serêkaniyê ye.Ev stasyon çavkaniya sereke ya ava vexwarinê ye ji bo zêdetirî 800 hezar kes ên bajarê Hesekê û gundên wê. Stasyona Elokê di sala 2010’an de weke bersivekê ji kêmbûna çavkaniyên ava vexwarinê re li Hesekê û gundên girêdayî wê hat avakirin. Ji ber ku ava bîrên tevahiya Hesekê şor e û nayê vexwarin hat xwestin ku bîrên kur li deverên nêzî çemên weke Xabûr û çemên din bên kolandin, bi taybet jî li devera Elok ku bi erdîngariya xwe cihekî istratejîk e. Hêjayî bibîrxistinê ye ku 34 bîrên avê yên kûr lê hene li gel wan jî 6 stasyonên ji bo berdana avê hene. Herwiha ev stasiyon dikare rojane nêzî 175 hezar m3 ji avê belav bike, hem jî bi dirêjahiya 67 km avê bighîne stasiyona Hume ya nêzî Hesekê û avê bide gund û bajêr. Rewşa şîneyên bajêr û gundewarên wê, hemjî dabînkariya avê ji bo wan piştî avakirin stasiyonê baştir bû, ev yek wiha domand heya êrişên dewleta Tirk li ser Girê Spî û Serêkaniyê.

**Piştî kiriyarên dagirkeriyê kirîzê dest pê kir**

Ji sala 2019’an ve piştî ku dagirkeriya Tirk û çeteyên wê êrişî Serêkaniyê û Girê Spî kirin û ew dever dagir kirin, stasyona Elok ji xizmetê derket. Herwiha piraniya amûrên stasiyona Elok jî ji hêla çeteyên dagirkeriyê ve hatin dizîn, av li ser Hesekê hat qutkirin, Netewên Yekbûyî jî tekez kir ku amûrên stasiyonê yên ku hatin dizîn buhayê wan bêtirî 200 hezar Dolarên Emrîkî ye.

**Çend caran ava Elok hat berdan û rawistandin?**

Piştî dagirkirinê cara yekem ku av dîsa ji bo şîneyan hat berdan di meha Îlûna 2020’an de bû, ji destpêka mehê heya 30’ê Berfanbara 2020’an av hat dayîn. Piştî wê jî, ji 1’ê Çileya 2021’ê heya 31’ê Berfanbara sala 2021’ê av bi hat dayîn, lê di nav re qutbûyîna avê gelek caran çêdibû. Herwiha ji 1’ê Çileya 2022’yan heya 31’ê Tebaxa heman salê av hat dayîn, lê dîsa bi qutbûyîn av dihat berdan. Piştî wê di 1’ê Îlûna sala 2022’yan de hat dayîn û heya 31’ê Gulana 2023’yan domand. Piştre bi rengekî qels û kêm ji 1’ê Îlûna 2023’an heya 4’ê Cotmehê av hat dayîn û paşê qut bû. Bi dirêjahiya sala 2024’an av ji Elokê bo şîneyên Hesekê û heta roja îro nehatiye dayîn. Bi vî hawî, 1 meliyon û 200 hezar şîneyên Hesekê di kirîza avê de dijîn.

**Qutkirina avê sûcekî çawa ye?**

Di rewşa dagirkerî û êrişan de hin zagon hene ku nabe tu dewleta dagirker wan bin pê bike, ev yek jî li gorî biriyarên navnetewî yê mafê mirovan. Di sala 1949 Peymana Cinêv a çaran de bi madeya 55’an biriyarek da, ev biriyar girêdayî rewşa dagirkeriyê bû. Tê de hat tekezkirin ku divê dewleta dagirker hemû pêdiviyan weke av, elektrîkê û hwd… ji şîneyên welatê dagirkirî re wî re pêşkêş bike, eger ev zagon jî hate binpêkirin, dikeve lîsteya tewanê şer. Bi mînaka qutkirina avê li ser bajarê Hesekê piştî dagirkirina Serêkaniyê, tê tekezkirin ku dewleta Tirk a dagirker sûnc û tewanên şer di derheqê şîneyên Hesekê de dide meşandin, li gorî zagonên navnetewî jî divabe were muhasebekirin.

**Hin proje ji bo bidestxistina avê**

Da ku rewşa gelên Hesekê aloztir ne be û kirîza avê bê çareserkirin, hem jî ava Hesekê bikeve xizmetê û bê vexwarin, Gernîndeya Avê ya Hesekê projeyên zelalkirina avê pêk anîn. Ji van pirojeyan 2 stasiyon li Holê, 6 li Şedadê, stasiyonek li Til Temir, stasiyonek li Mexrûm, yeke din li Um Midfee, li hêleke din 20 stasyon û çavkaniyên avê yên taybet û giştî hatin amadekirin. Ji çavkaniya Şemoka ya sereke av tê hemû stasiyonan, herwiha projeya ava Furatê hat amadekirin û piştî çend mehan di dawiha sala 2024’an de ji ber qutbûna elektrîkê hat rawistandin.

**Hewldanên çareserkirina avê li Hesekê**

Da ku stasiyona Elokê bikeve xizmetê gelek hewldan hatine kirin, sedem ew ku ev stasiyon jêdera bingehîn a peydakirina avê ji bo bajarê Hesekê, gundewarên wê û Tiltemir ê ye. Gernîndeya Avê ya bajarê Hesekê ji me re diyar kir ku miliyon û 200 kes sûd ji ava Elokê werdigirtin, niha jî ji sedî 10 rêjeya avê ya ku şîneyên Hesekê sûdê jê werdigirin, ev rêje ji bîrên Şemoka tê bidestxistin û bi riya tangerên avê li şîneyan tê belavkirin. Herwiha heman jêderê destnîşan kir ku ji bo Stasiyona Elok bikeve xizmeta gel de av ji hêla Rêveberiya Xwer ve elektrîk ji bo stasiyonê hat û tê dayîn, lê dewleta Tirk a dagirker tevî vê yekê ne li gorî peymanan dimeşe. Piştî ketina rêjîma Baas çavên gelên Sûriyê û bi taybet şîneyên Hesekê li hin gavan e ku were avêtin, di serî de mijara ewlehiyê û çareserkirina kirîza avê ya ku temenê wê bû 5 sal. Di roja îro de tê zanîn ku daxwazeke yekane ya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û saziyên civaka sivîl heye ku ne tenê mijara avê ya ku dagirkeriya Tirk weke dosyake zextê bi kar tîne, bi dawî bibe, lê belê daxwaz ew e ku dagirkerî destwerdana xwe di dosyayên girêdayî gelên Sûriyê de bi dawî bike û xwe vekişîne ji xaka Sûriyê.



## Hevgirtin

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Pirsa hevgirtinê di mijara azadî û serkeftinê de cîhekî xwe yê bingehîn heye. Ger hevgirtin li ser prensîb û pîvanên giştî be, ew ê pêşveçûn û armanc jî zûtir çîbicî bibin.

Mirov an jî civak dema li ser armancan bigihêje hev, kare ji bo paşerojê tiştên giranbuha pêşxîne.

Di dîroka mirovahiyê de, civakên qels û lawaz li derdora armancekî kom bûne û hevgirtina xwe pêş xistine, bi vê hevgirtinê karîbûne serkeftinên dîrokî bidest bixin.

Divê mirov an civak xwedan aramancên biqedir û bilind bin. Girêdana bi armancan karekî girîng e. Hevgirtin ger bê armanc be wê demê belavbûn çêdibe.

Di bizavên olî de, armanc bidestxistina rawiştekî (exlaqî) bilind û pêve girêdayî islahkirina hawîrdore.

Li gor Civakekî Îslamî, divê hevgirtin li ser wan pîvanan pêk were:

“Di başî, qencî û helgirtina berpirsiyariyê de hevkarê hev bin, di guneh, neheqî û tevlîhevîyê de hevkariya hevdû nekin”. (Beqere 2)

Divê em jibîr nekin, kesên bawermendên ola Îslamê ne vê ayatê ji xwere weke armanca jiyanê ya sereke pêşwazî bikin.

Li gor vê ayetê; kesê ji Qur’ana pîroz bawer dikin, li ser başî, dadwerî, exlaqê paqij, xêr û qenciyê hevkariya hevdu dikin.

Teqez: li ser xirabî, zilm, nebaşî û xapandinê hevkariya hevdu nakin!

Ger mirov vê ayetê tenê di nava kesayet û civakên misilmanan de bicîh bike, wê bibin kesayetên xurt û civakên mînak.

Lewre ev ayet takekesîyek (qerekterek) ji bo kesên pabendê wê ne, şênber û eşkere dike.

Ev ayet berê me dide dîroka ku mirovahîyê bi kiryar û tecrubeyên xwe başî û qencî zelal kirine.

Li beramber derewkarî û xapandinê, rastî û durustî. Li beramber dizî û kedxwariyê, xebata helal û zîrekbûn. Li beramber cahilî û nezaniyê, xwendin û xwezanekirin.

Li beramber neheqî û zilmê, dadwerî û heqnaskirin û bicihkirin. Li beramber şer ,pevçûn û xerakirinê, aşitî, aramî û înşa.

Li beramber koletî û mêtîngeriyê, azadî û wekhevî.

Li baramber Xweda nenasî, xwe nenasî, serkêşî û ji rêderketinê; Xweda nasî û xwenasî, dilnizmbûn û dirêjkirina destê biratîyê.

Hevkariya başî û qencîyê fermana Qur’ana pîroze: ger ev hevkariya başiyê di kesayet û civakan de pêş nekeve, divê ew kesayet û civak têkiliyê navbera xwe û ola îslamê carekî din nûjen bikin. Ev ayeta hanê, kerektera civakekî Îslamî radixe ber çavan.

Ger em rastiya kesayet û civakên misilmanên îro şîrove bikin, em ê bi nêzikbûnên dûrî Qur’anê ve werin suçdarkirin.

Îro hemû civak û kesayetên misilman, li ser tiştên Xwedê qedexekirine hevkariya hevdu dikin.

Hêza madî li ku derê be, xwe li wê derê cîbicîh dikin.

Pere û desthelat çi fermanê bikin, piraniya me wan fermanan pêk tînin.

Werin em hemû bihevre hevkariya aştî û daweriyê bikin. Em li cem feqîr û mezluman cîh bigrin.

Ji bo gele Kurd yê kedkar û berxwedêr jî rêya tekane, çareseriyê rêya doza rewa ye. Doza me dozekî heqe, dozekî rewaye û divê liser doza xwe em heta dawiyê hevkariya hevdu bikin. Ger em li ser doza xwe ya rewa, kar û berpirsiyariyên xwe pêk bînin wê demê serkeftina armancên me, dê pêk were.

Hevkariya gelê me bi rengekî xurt li ser maf û heqiyê, dê bibe mînak ji bo derûdor û cînarên me. Dema ev hevkarî ji bo azadî, aşitî, aramî, dadwerî û zîrektî be, wê serkeftinên me jî mezintir û qîmettir bin. Hevkariya azadiyê wê bi xwe r azadiyê bîne.


# Taxa Qedûrbek yek ji kevintirîn taxên bajarê Qamişlo ye

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Taxa Qedûrbek yek ji kevintirîn taxên bajarê Qamişlo ye, ew bi avakirina Qamişlo re hatiye avakirin. Navê vê taxê li ser navê yekem malbata ku li taxê niştecih bû hatiye kirin.**

Qedûrbek yek ji taxên herî kevn ên bajarê Qamişlo yê. Ew bi pirrengiya xwe ya civakî ya hevgirtî tê naskirin. Ev tax yek ji taxên gelêrî yên kevnar ên kurdan tê hesibandin û ew bi avakirina Qamîşlo re hatiye avakirin. Ew li bakurê rojavayê rêya sereke ye û ji aliyê rojhilat ve bi taxa Meyselûn ve tê sînordarkirin, di navbera wê û bazarê de riya sereke ya bajêr heye. Li aliyê başûrê wê jî taxa Zeytûniyê heye, ku dirêjahiya gundê Mahmakiyê ye û dikeve ser sînorê Tirkiyê. Ji aliyê rojava ve bi çemê Ceqceq re sînordar e.

**Taxa Qedûrbek bi pirrengiya pêkhateyên xwe navdar e**



Ev tax bi pirrengiya pêkhateyên xwe ji taxên din tê cudakirin, ji ber ku pêkhateyên wê ji Kurd, Mehelmî û hin Erebên ku ji gundên derdora Tirbespiyê koçber bûne, tê de dijîn. Gelek stranbêjên navdar wek Merwan Sebrî, Selah Resûl, Ednan Seîd û hwd ji vê taxê derketine. Di heman demê de ev tax ji hêla hevkariya di navbera niştecihan de tê naskirin.

Li destpêka taxê Şirketa Tûtin ango ya ku jê re dibêjin (Rêcê) heye û li dawiya kolana Rêcêjî goristana xiristiyanan heye. Di nav taxê de bexçeyek biçûk ku şênî jê re dibêjin (Meştel) jî dihewîne û tê de xelk ji bo bêhnvedanê kom dibin û şa dibin. Her wiha dibistan jî di nav de dibistana El-Weam, El-Zehraa û dibistana Hafiz Îbrahîm jî hene. Ev tax bi gelek mizgeftên xwe navdar e û yên herî girîng ev in: Mizgefta Îmam El-Xezalî, Mizgefta Xalid Bin El Welîd, Mizgefta Elî Bin Ebî Talib, Mizgefta Îbrahîm Heqî û Mizgefta Goristanê.

Ev goristan bi navê Goristana Îslamê tê nasîn ku karwanê şehîdên Serhildana 12 adrê û Şêx Meşûq El-Xeznewî tê de spartine axê.

Ji bo pêdiviyên şêniyên taxê bi cih bînin li taxê gelek firoşgeh derketin holê. Gelek urf û adetên ku kurd bi wan tên naskirin li vê taxê belav bûne, wek hevkarî. Piraniya şêniyên taxê di navbera tax û bazarên Qamişlo de, li ser erebeyan an jî li ser motorsîkletên sê teker wek firoşkarên kolanan dixebitin.

**Taybetmendiya vê taxê welatparêziya wan e**

Dema ku Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jin hatin avakirin, gelek xort û keçên taxê ji bo parastina xaka xwe û hesreta azadî û jiyaneke bi rûmet tevlî van hêza bûn, bi dehan şehîd ji vê taxê hene.

Tax nêzî 14 komînan dihewîne da ku kar û xebat ji bo xizmeta gel bê kirin.



# Planên Enqerê li Bendava Şehîdan têk çû

Bendava Tişrînê bû kelha berxwedanê ya dîrokî ku armanca Enqereyê ya têkbirina Rojava, binxist. Li gel êrişên esmanî û bejayî jî berxwedana Tişrînê rê neda û veguherî barîna berxwedana gel. Çalakiya nobedê ya ku gelên Kurd, Ereb, Asûr, Ermen û Tirkmen li dijî êrişan dabûn destpêkirin, di roja 118’an de bi serkeftinê tacîdar bû..

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Piştî ketina hikumeta Şamê, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê êrişên xwe li dijî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dijwartir kirin; bi taybet bajarê Minbicê û Kantona Firatê kirin armanca êrişên xwe. Di 8`ê Kanûna 2024’an de dewleta Tirk û çeteyên wê bajarê Minbicê dagir kirin. Dagirkeran piştre jî bi tank, top, balafirên şer ên bêmirov, obîs, mûşek û hawanan berê êrişên xwe dan Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê. Ji bo aştiyeke domdar û azadîyeke ku her kes cihê xwe di navde bibîne, bi hezaran ji gelê Rojava li Bendava Tişrînê cih girtin û gelê Bakurê Kurdistanê jî li ser sînorên Bakurê Kurdistanê piştgiriya gelê Rojava kirin. Berxwedaneke piralî ye ku gelê kurd dida meşandin, piştgiriyeke piralî ji gel û şervanan re hat kirin. Bi têgihiştina berpirsiyartiyên demê, gel bi keç, xort, kal û pîrên xwe berê xwe dane Bendava Şehîdan. Bi têgihiştina ku ev dê bibe xeleka dawî ji xelekên ber bi serkeftinê ve, her kes kete nava liv û tevgerê. Dayikan dema ku berê xwe didane bendavê, ev yek mîna erkekî dîrokî û wijdanî didîtin û di kêliyên herî zor de jî li gel şervanên xwe bûn û di şerê hebûnê de cihê xwe girtin. Bendava Tişrînê û Pira Qereqozaqê di aliyê aborî, siyasî û leşkerî de gelekî girîng in. Pira Qereqozaqê li ser rêya M4 a navdewletî ku herdu aliyên çemê Firatê bi hevre girê dide dikeve û ji bo bazirganiya herêmê jî girîng e. Bendava Tişrînê jî pêdiviya piraniya kehrebê ya Kantona Firatê û Minbic, beşek Heleb û hinek deverên Tebqayê û Cirîzê pêk tîne. Dîsa ji bo çandiniyê jî çavkaniyek sereke ye. Ji bilî van taybetmendiyan herdu dever ji bo ewlekariya herêmê di asta stratejîk de ne. Li gorî pisporan, hêzên ku li van deran serwer bibin, wê karibin tevahiya Herêma Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê jî kontrol bikin. Dewleta Tirk a dagirker jî, dema HTŞ’ê berê xwe da Şamê, bi van hesaban xwest Tişrîn û Qereqozaq dagir bike û Rêveberiya Xweser ji holê rake. Rayedarên Tirkiyeyê bi daxuyaniyên xwe ev yek eşkere dikirin.

**Çi li bendava Şehîdan hat jiyankirin?**

Di wan 118 rojan de çi qewimî? Werin em bi hev re bi bîr bînin... Bi ruxandina rejîma Baas re, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê re êrîşên xwe yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde kirin. Bi taybet Minbic û Kantona Firatê bûn armanca sereke ya van êrîşan. Di 8’ê Kanûna 2024’an de Minbic ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hate dagirkirin. Piştî van êrîşan Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaqê bi tank, obus, balafirên şer, balafirên bêmirov, fuze û hawanan hatin armancgirtin. Dewleta Tirk û çeteyên wê li navenda bajarê Minbicê û gundewarên wê li dijî sivîlan komkujî pêk anîn. Dewleta Tirk a dagirker ku bi van êrîşan xwest yekîtiya gelên ku bi salan e bi hev re jiyan dikin têk bibe, piştre êrîşên xwe yên li ser gundên Tişrîn, Qereqozaq, Sirîn û Kobanê berfireh kirin. Di navbera 5 û 10’ê Kanûna 2024’an de li Minbicê û derdora wê 19 hemwelatî şehîd ketin û 4 jî birîndar bûn. Li gorî agahiyên ne fermî, hejmara kuştiyan zêdetir bû. Di navbera 8’ê Kanûna 2024’an û 9’ê Sibata 2025’an de li bejahiya Eyn Îsayê 24 sivîl hatin qetilkirin. Li bejahiya Kobanê û bajarê Sirînê, di encamê de 33 welatiyên ku di nav wan de rojnamevan, zarok û jin, kal û pîr hebûn jiyana xwe ji dest dan û 12 welatî jî birîndar bûn.

**Berxwedana bêhempa ya gel û şervanên azadiyê ya 118 rojan**

Dema gel êrişên dagirkeriyê dîtin, di çaxekî de ku êriş dijwar bûn û ti alî bawer nedikir ku vîna gel di nava Şoreşa 19`ê Tîrmehê de bi vî qasî deng vede, pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryan-Asûr, Ermen û Êzidî 8`ê Çileyê li Bendava Tişrînê hatin cem hev û li wir bi navê “Berxwedana Bendava Şehîdan” destanên lehengiyê xêzkirin. Çalakvanan li gel sermaya zivistanê, di 15`ê Sibatê, 8`ê Adarê, 15`ê Adarê, Newrozê û cejna Remezanê li ser bendavê pêşwazî kirin. Xelkê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi armanca xwedî li destkeftiyên Şoreşa Rojava derket û li dijî van êrîşên hovane piştgirîdana şervanên azadiyê li ber xwe didin û bê didulî berê xwe dan bendava Şehîdan. Xwedî derketina gel a li şervan û destkeftiyên Şoreşê mirov dikare di çarçoveya Şerê Gelê Şoreşgerî de binirxîne. Gel jî xwe ji vî şerî cuda nabîne û dizane ev şer wê qedera wan û herêmê diyar bike. Lewma tevî hemû êrîşan bi îradeyek xurt kom bi kom berê xwe dan Bendava Şehîdan. Dewleta Tirk a dagirker bi armanca çavê gel bitirsîne, îradeya wan têk bibe, di warê pskolojîk de bandorê li ser şarvanê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê çêke bi zanebûn û plankirî êrîşî xelkê sivîl kir. Çapemeniya Azad gelek caran dîmenên van êrîşên hovane bi raya giştî re parvekir û rûyê reş ê dewleta Tirk a dagirker aşkere kir. Di dîmenan de pir aşkere tê dîtin ku dewleta Tirk sûcê şer dike. Ev êrîşên li dijî xelkê sivîl bi awayekî aşkere binpêkirina hiqûqa navneteweyî ye. Parastina sivîlan a li qada şer, berpirsyartiyeke navneteweyî ye. Lê dewleta Tirk van peymanan û hiqûqa navneteweyî binpê dike. Ev li gorî Peymana Cinewreyê û qeydên hiqûqa navneteweyî divê dewleta Tirk ji ber van sûcên xwe yên şer di qada navneteweyî de bê darizandin. Lê, ji ber ku berjewendiyên hêzên navneteweyî ketiye pêşiya hiqûqa gerdûnî îro ev sûcên tên kirin jî bê ceza dimînin. Ji 8`ê Çileyê heta 5`ê Gulanê ji Kantona Firatê 8, ji Kantonên Tebqa, Reqa û Dêrazorê 7 û ji Kantona Cizîrê jî 19 komên cuda tevlî çalakiya nobedariya bendavê bûne. Gelek bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhate û saziyên xwe ve, tevlî berxwedana bêhempa ya 118 rojan bûn. Çalakiya nobetê di 8’ê Çile de dest pê kir. Gelên ku êrîşên dagirkeriyê ji nêz ve dişopandin, di 8’ê Çile de, di demeke ku êrîşên herî dijwar bûn û kes li bendê nebû ku vîna gel di Şoreşa 19’ê Tîrmehê de ewqas xurt derkeve holê, bi pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryanî, Asûrî, Ermenî û Êzidî li bendava Şehîdan hatin cem hev û destana vîn û berxwedanê nivîsandin. Ji 8’ê Tîrmehê heta 5’ê Gulanê ji Kantona Firatê 8, ji Kantonên Tebqa, Reqa, Dêrezorê 7 û ji Kantona Cizîrê 19 komên cuda beşdarî nobeta berxwedanê ya li bendavê bûn.

**Hejmara şehîd û birîndarên Bendava Tişrînê**

Di berxwedana ku 118 rojan de 331 şervanên QSD û YPJ’ê û di encama êrişên esmanî yên balafirên dewleta Tirk a dagirker û 30 welatiyên ku di nava wan de rojnamevan, siyasetmedar, hunermend jî hebûn şehîd bûn û 240 welatî jî birîndar bûn. Rojnamevan Nazim Daştan, Cîhan Bilgîn û Egîd Roj (Şervan Sîdo,) Şanoger Bavê Teyar (Cuma Xelîl Ibrahîm,) Rêhener Kefo Osman, Endamên Meclisa PYD’ê Menîce Heyder û Mihyedîn Omer û Mizefer Mihemed, Endamê Saziya Malbatê Şehîdan Ebdulqadir Ibrahîm, Endamên HPC’ê Hezna Ebdê û Mihemed Şefîq Ismaîl, Hêza Mistefa û hevjînê wê Edhem Mistefa Elî, Osman Ibrahîm, xwendekara Zanîngeha Rojava Ronîza Mihemed, Endamên Desteya Tenduristî Lînda Şelebî û Osman Ibrahîm, Endama TEV-ÇAND ya Hîlala Zêrîn Diyala Mihemed, Silêman Azad, Ferhan Şêx Hesen, Zozan Fêsel Hemo, Elî Şaşo Ebas, Emar Derwêş Hesen, Kurdo Necdet Bozo, Mihemmed Xelîl Hemo, Mihemed Mehmûd Şefîq Ismaîl, Mihyedîn Hesan Emar, Mistefa Mehmûd Cimo, Mizafer Mihemed Remedan.



**Hewildanên bêdengkirina ragihandina rastiyan**

Di encama êrîşên esmanî yên dewleta Tirk a dagirker ên li ser gel de, di Berxwedana Serdemê ya Tişrînê de 26 welatiyên ku di nav de rojnamevan, siyasetmedar, rêveber û hunermend jî hene şehîd bûn û herî kêm 240 kes jî birîndar bûn. Rojnamegerên ku êrîş û geşedanên li herêmê dişopandin bi şervanên li eniyên şer re hewl dan rastiyê ragihînin. Di vê pêvajoyê de di 19’ê Kanûna 2024’an de nûçegihana ANHA’yê Cîhan Bîlgîn û rojnamevan Nazim Daştan li ser rêya Bendava Tişrîn û Sirrînê di encama êrîşa esmanî ya dewleta dagirker de şehîd bûn. Rojnameger Egîd Roj jî di 15’ê Sibatê de dema ku li bendava Tişrînê berxwedana gel dişopand û hewilda ku rastiyan bigihîne cîhanê, di encama bombebaranên balafirên artêşa Tirk a dagirker şehîd ket. Herwiha di Berxwedana Serdemê ya Bendava Şehîdan de bi dehan rojnameger jî birîndar bûn.

**Berxwedana dîrokî ya 118 rojan serkeftin bi dest xist**

Rayedarên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li hundir û derveyê Sûriyê ji bo helwestgirtina li dijî êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk û rawestandina êrîşan gelek peywendî danîn. Di encama van xebatan de di 10’ê Adarê de di navbera Fermandarê Giştî yê QSD’ê Mazlûm Ebdî û Serokê Hikûmeta Şamê Ehmed El Şara de peymanek ji 8 xalan pêk tê hate îmzekirin. Di xalan de nûnertiya wekhev a bawerî û nasnameyên niştimanî yên gelê Sûriyê, dabînkirina xizmetguzariyên ewlekarî û giştî, vegera bi ewle ya koçberan, rawestana li hember axaftinên nijadperestiyê û helwestên ku dê nakokiyan derxînin û misogerkirina agirbestê li seranserê welat. Di encama nobeta gel û berxwedana dîrokî ya şervanan de êrîşên li ser Bendava Tişrîn û Pira Qereqozaqê hatin rawestandin. Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî di 5’ê Gulanê de û piştî berxwedaneke bêhempa û serkeftî bi daxuyaniyekê dawiya nobeta li bendava Şehîdan ji raya giştî re ragihand. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku ev pêvajo bi ser ketiye û hat destnîşankirin, ku têkoşîna li dijî her cure êriş û gefan wê bidome.

**Bi gelek stran û awazan berxwedana bendava Şehîdan hate vegotin**

Hêjayi gotinê ye ku Berxwedana Bendava Şehîdan coş û kelecaneke bê sînor da tevahî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi taybet jî hunermend, nivîskar û rewşengîr û gelek stran, beste û helbest li ser berxwedana gel hatin nivîsandin û gotin. klîba bi navê “Bendava Me Ye” ji aliyê Hunergeha Welat ve hatiye amadekirin û bi derfetên kêm li bendavê hatiye kişandin, yek ji van stranan bû. Di klîbê de kêliyên taybet ên di nobeta berxwedanê de hatin kişandin. Her wiha klîbên berhemên “Guje Çemê Me”, “Bendava Berxwedanê”, “Li Binxetê” û “Bendava Lehengan” yên Hunergeha Welat û Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamya (TEV-ÇAND) li bendavê hatin kişandin û kêliyên pir germ û bi wate hatin jiyan kirin.

# Xweparastin navê vê pêvajoyê ye

Pergala ku li ser jirêderxistina her tiştî ji cewher û hebûna wê hatibe avakirin..Gelo dikare cewherê feraseta xweparastinê di civakê de mayînde bihêle? Ger Rêber Abdullah Ocalan ev pêvajo bi "Xweparastinê" pênase kiriye, wê demê em ê giringiya xweparastina cewherî di avakirina civakeke ku li hember hemû diyarde, zihniyet û pevçûnan xwe biparêze, têbighêjin.

**Esma Mistefa**

Gerdûna heyî bi hemû zindiyên xwe xwedî refleksa xweparastinê ne. Ger nebat, lawir û mirov dibe, bi awayekî ji awayan da ku hebûna xwe berdewam bikin, pêwîstiya wan bi xweparastinê heye. Ev yek jî weke diyardeyekî xwezayî pêşdikeve. Ger em bala xwe bidinê di serdema destpêkê de dema civakbûyîn bi kilanên biçûk tê avakirin, li hember diyareyên xwezayî weke (lehî, baran, êrişên lawiran, tofan û hwd) mirovahiyê xwe di şikeftan de diparast, ev yek jî weke şêwazekê xweparastinê bû. Bi vê re em dikarin weke şêwazê destpêkê yê xweparastinê bi nav bikin. Di xwezayê de hemû hebûnan, xwedî mekanîzmeya xweparastinê ne. Bi taybet di cîhana zindiyan de jî her cure zindî, li gorî taybetmendiya xwe, xwedî pergala xweparastinê ye. Zindiyekî ku bêparastine di xwezayê de nîne.

Di bingeha civakbûyînê de dijminahiya hev du nîn bû da ku bi çek û amûran xwe biparên û şer bikin. Ev yek herî zêde li hember lawiran dihate bikaranîn. Da ku em zêde dirêj nekin parastin ne bi şêwazê êrişê û dijminahiyê dihat bikaranîn. Ev yek tenê weke refleksekе xwezayî da ku zindî hebûna xwe biparêzin.

### Veguhartina cewherê xweparstinê di pergala heyî de

Pergala heyî ev yek bi awayekî şaş û ji cewherê xwe durketî pênase kir û bi kar anî. Bi pêşketina serdemê re û destpêkirina zihniyeta serdest re ku demek dirêj ji dîrokê wergirt; gihît asta ferizkirina zihniyeta dijbertî û dijminatiyê. Bê guman bi hatina serdema serdest û zihniyeta modernîteya kapîtalîst re ev yek belav bû û mirovatiyê xwe di posizyona dijberî û parastina berjewendiyan de xwe dît. Bê guman bi salên dûr û dirêj re ev yek gihîş vê astê û êdî li şûna refleksa xweparastinê ya xwezayî ku tu zirarê nede mirovahiyê, şer, pevçûn, dijberî û êriş hatin destpêkirin.

Bi vê yekê û şûnve tu wateya xweparastina cewherî ya ferd, kom, qebîle û civakê da ku hebûna xwe mayînde û zindî bihêle, nema. Her kes da ku berjewendî û hebûna xwe ya serdest biparêze, şer dan destpêkirin û ev bûye weke pergalekî giştî di rastiya îro de. Dewlet-netew û hêzên sermayedar hebûna xwe bi vê rastiyê re didomînin û hemû mirovahî li ser wê terbiye kirin heyanî kirin zihniyetek ku di xwezaya mirovahiyê de were rûniştandin.

### Rêber Abdullah Ocalan û parastina cewherî

Rêber Abdullah Ocalan ku zêdetirî 50'î salî ye li hember zihniyeta serdest şerê guhartina bîrdozî dide meşandin, ev yek di bîrdozî û felsefeya xwe de bi sala ye da ye destnîşankirin, nirxandin û çareseriya wê yekê diyar kiriye. Di felsefeya Rêber Apo de mirovahî li ser kîjan bingeh û mîrasê avabûye û pêşketiye di civaka xwezayî de, dinirxîne û girêdanbûna wê bi rastiya heyî û şêwazê guhartina pargala heyî re; girê dide û dinirxîne. Di mijara parastina cewherî de jî vê yekê tekez dike. Cawa ku em bikaribin mekanîzmeya xweparastinê ya xwezayî di civaka heyî de weke parastina cewherî bikarbînin.

Di vê mijarê de gelek nirxandinên Rêber Apo hene, yek ji wan nirxandinan jî wiha dibêje: "Xweparastin navê vê pêvajoyê ye. Civaka di xwebûnê de israr dike, her cure mêtinkarî û hewcedarkirina yekalî red dike, bi tenê bi sazî û derfetên xweparastinê dikare vê helwesta xwe pêşve bibe. Xweparastin bi tenê li dijî xeteriyên ji derve tê, pêk nayê. Di avahiyên hundir ên civakê de jî her tim nakokî û tengezarî mumkîne pêk were."

### Şerê Gelê Şoreşgerî û Parastina Cewherî

Bi taybet bi Tevgera Azadiya Kurdistan re ev yek di nava gelê Kurd de mayînde bû û bi Şerê Gelê Şoreşgerî re ku Rêber Apo di sala 2010'an de banga gelê Kurd kir ku li ser bingeha Şerê Gelê Şoreşgerî xwerêxistin bikin; zêdetir belav bû û gel li ser wê bingehê xwebirêxistin kir. Bi Şoreşa 19'ê Tîmehê re ev yek bi avakirina HPC'ê di sala 2014'an de stratejiya parastina cewherî di nava civakê de bû terzekî nû yê parastina mal, tax, civak û welat. Gel di Rojavayê Kurdistanê de di hemû sazî û hêzên parastinê de cih girtin. Hêzên Parastina Cewherî HPC'ê jî yek ji dendikên xweparastina civakê bû. Li ser vê bingehê çawa ku gel ji kal û pîrên temen mezin û ciwanên wê bigire di nava taxê de derdiketin û parastin dikirin, bi fonksiyon û berpirisyartiya



parastina vê şoreşê re rû bi rû jiyan dikirin.

### Hêza gelê şoreşger derdiket pêş

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ku di encama bedelên pîroz de gihîştiye vê astê, xwedî mîrateyeke pîroz ji ked û bedeldayînê ye. Li hember dijmin û hemû komên çeteyên ku dixwastin destkeftiyên vê şoreşê têk bibin, li hember wê hêza gel a şoreşger derdiket pêş. Gel bi banga Rêber Apo ya ji bo Şerê Gelê Şoreşgerî re, xwe li ser stratejiya Şerê Gelê Şoreşger birêxistin kirin û şerê hebûnê li hember dijmin û hemû hêzên mêtînger meşandin. Mînaka vê yekê jî ku Rêber Apo Şerê Gelê Şoreşgerî nimûneya wê di Şerê Taxên Şêx Meqsûd û Eşrefiyê li bajarê Helebê destnîşan kiribû. Bi aloziya Sûriyê re, hêzên opizisyonê bi giranî her du taxên ku piraniya wan kurd in, xistin hedefa xwe û êriş wan kirin, herwiha rejîma Baas bi êriş û dorpêçkirina taxê, xwest îradeya wî gelî têk bibe. Lê li hember hemû pilan û êrişan gel ne dev ji taxê berda û ne jî hişt ku hêzên derve derbasî taxê bibin. Gel li kêleka şervanên YPG-YPJ'ê bûn û bi vî awayî heyanî vê kêliyê jî xwe parastin. Bê guman di dîroka Têkoşîna Kurdistanê de ev ne mînaka yekê ye.

### Em bûn şahidê komkujiyên bê heq û maf

Ger em bala xwe bidinê di Sûriyê de piştî rûxandina rêjîma Baas û hatina hikumeta nû a şamê. Em bûn şahid ku komkûjî pêk hatin. Bi taybet bi fikirên olperest û nijadperest, Gelê Elewî di komkujiyên ku di dîrokê de neyên ji bîrkirin re, derbas kirin. Gelo çima ewqas komkujî, çima ewqas kîn û nefret ger ew dixwazin aştî û aramî bê avakirin? Gelê Elewî bi pêkanîna van komkujiyan re bi hezaran hatin kuştin. Gelo di vê kêliyê de em girîngiya parastina cewherî nabînin? Ne tenê gelê Elewî gelê Sûriyê bi giştî di van komkujiyan re derbas bûn. Lê hêza ku wan biparêze û xwedî lê derbikeve nebû. Bi serkeftinên ku di herêmên Rêveberiya Xweser de hatine jiyan kirin û dema pirojeya Netewa Demokratîk dibînin. Girîngiya hevgirtin û xweparastinê dibînin. Ku îro banga Rêveberiya Xweser tê kirin da ku xwe di bin siya wê de biparêzin.

### Bi stratejya Şerê Gelê Şoreşgerî.. Şoreş tê parastin

Em ê bi van nirxandinan bighînin encama rastiya gel a ku Parastina Cewherî weke erk ji xwe re hilpijartin û şoreşa Rojavayê Kurdistanê parastin. Pê ve girêdayî stratejiya Şerê Gelê Şoreşger ku bûye terzê jiyana gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya ku careke din di Berxwedana Bendava Şehîdan de zindî bû ye. Li ser vê bingehê em têdigihêjin ku dema yekbûna gel bi hêza leşkerî re bê avakirin, wê ewqas serkeftin û destkeftî bêne bidestxistin û parastin. Gel di Şoreşa Rojavayê Kurdistanê de ev yek pêk anî û felsefeya Rêber Apo di pratîkê de bi encam kir.

Bi ewqas berxwedanî û têkoşîn di salên dûr û dirêj de ev gel bes nekir û her di meydanên şer de weke hêza yekemîn ji komînan bigre heyanî eniyên şer, li kêlek şervanên vê axê şer kirin û kêliyên efsanewî jiyan kirin. Ji lewra em dibînin ku çavên hemû cîhanê di asta navnetewî û herêmî de li Rojavayê Kurdistanê ye. Ev rastiyeke û di roja îro de tê jiyankirin. Ka ev gel xwedî hêzeke çawa ye û ev îrade jêdera xwe ji kuderê digre.



## Kes baweriyê bi desthilata li Şamê nake!

**Mihemed Seydî**

Ev zêdetirî 5 Heyvin ku serokê rêjîma Baas Beşar El-Esed ji Sûriyê reviya ye û desthilat ketiye destê koma Ebû Mohamed El-Colanî. Rûyê heyî Ehmed El-Şerie lê kî wî bi rê ve dibe eşkereye. Di hemû tevgerên desthilata demkî ya li Şamê de dewleta Tirk heye ku hewl dide axa Sûriyê bi riya radîkalên Islamîst û çeteyên DAIŞ'ê ku niha navên cuda li xwe dikin kontrol bike. Li gorî hin agahiyan, dewleta Tirk plan danî ku bi riya tirsê û komkujiyan hemû xelkê Sûriyê kontrol bike. Çawa DAIŞ'ê serweriya gelek deveran di dema avabûna xwe de xist destê xwe, xwestin vê yekê destpêkê li Berava Sûriyê li deverên Elewiyan pêk bînin. Wekî ku di gelek Vîdyoyên dema komkujiyên li gundên Elewiyan de jî xuya bûn, çeteyan gef dixwarin û digotin em ê piştî ew ji vir biqedin ew ê li dijî Durzyan dest pê bikin, dema êriş li ser tax û deverên Durziyian jî çêbûn, gef xwarin û digotin ew ê piştî Durziyan biqedînin ew ê berê xwe bidin Kurdan. Ev wekî plan ji van çeteyan re ji aliyê dewleta Tirk ve hatibû danîn û ne gotinên ji xwe berin, lê helwesta ku Îsraîlê jî li hember vê tevgera qirkirina Durziyan nîşan da, dewleta Tirk bêdeng kir. Îsraîl jî ne ji bo xatirê Durziyan, lê ji bo radîkal û Îslamîstên DAIŞ'ê yên girêdayî dewleta Tirk neyên ser sînorê wê ket tevgerê. Di warê dîplomasî de jî dewleta Tirk xwest hin hêzên Rojavayî baweriyê bi Ehmed El-Şerei bînin da ew karibe hebûna xwe li nava Şamê misoger bike, lê li her deverê li pêşiya xwe şertê beşdarkirina Kurdan û hemû pêkhateyên Sûriyê di nava Hikûmetê û rêveberiyê de dîtin ku ew naxwazin vê bikin. Her wiha mijara terorê û şerê li dijî DAIŞ'ê jî şertên bingehîn bûn ku tê wateya têkbirina projeya dewleta Tirk. Di demên derbasbûyî de, ne ji hikumeta ku dewleta Tirk li Şamê ava kiriye lê ji devê wezîrê Karê derve yê dewleta Tirk Hakan Fîdan daxuyanî li pey daxuyaniyê derketin ku digot ew sîstema Federal qebûl nakin, divê Kurd çekan deyînin û bila dosiya girtiyên DAIŞ'ê radestî Şamê were kirin. Ev yek jî eşkere dike ka çiqasî dewleta Tirk li pêyî wê yê ku Kurdan bê hêz û bê par bihêle. Lê careke din bersiv ji Fransa derket ku ew vê Hikûmeta heyî qebûl nakin û Kurd xeta sorin. Ev yek jî di hevdîtina li Parîsê di pêşwazîkirina Ehmed El-Şerie de eşkere bû. Serokê Fransa Emenwel Makron li pêş Kamîreyan ji Şerei re got ku bawerî bi we nayê kirin û divê bi QSD'ê û Kurdan re lihevkirin pêk were û di şerê li dijî DAIŞ'ê de alîkar bin. Esas ev mesaj berî her tiştî ji dewelta Tirk re bûn ku ew ê radîkalên biyanî li nava Sûriyê bi tu awayî qebûl nekin û rengê kuştina Durziyan û bêdengkirina Elewiyan û qirkirina Kurdan re çavên xwe negrin. Lê gelo ew ê çawa bibe ku ger Ehmed El-Şerei bibêje ew ê tevlî şerê li dijî DAIŞ'ê bibe? Ma çi ferq di nava DAIŞ û komên Ehmed El-Şerei de heye? Ew ê bi cihkirina çete û kujerên xelkê Sûriyê yên weke Hatim Ebû Şeqra û Ebû Emşe xwe li ser lingan bigre? Na, ne xêr, ew ê tu bawerî bi vî mêjiyê neyê. Ne hêzên Navnetewî û ne jî xelkê Durzî, Elewî û Bakur û Rojhilatê û Sûriyên Azadîxwaz wê baweriyê bi mêjiyê DAIŞ'iyên bi kirasên nû de neyînin. Li xwe kirina Garefêtan kes nayê xwapandin.



# 'Armanc ne tenê qirkirina Durzî û Elewiyan ne'

Li gundewarên Şam û Siwêdayê, aloziya di navbera hêzên desthilata Şamê û komên girêdayî Durziyan, veguherî şerekî çekdarî. Di encamê de ji her du aliyan kuştî çêbûn. Siyasetmedarê Durzî Semîr Ezam diyar kir ku armanca desthiladara Şamê qirkirina tevayî pêkhateyên Sûriyê ye.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Li taxên Eşrefiyê, Sehnaya û Ceremana yên Şamê di navbera Durzî û deshilatara Şamê de 29`ê heyva borî de şer û pevçûn derketin, di encamê de zêdetirî 73 kesî jiyana xwe ji dest dan. Herwiha hinek kes jî birîndar bûn. Ji bo rawestandina şer banga destwerdanê hat kirin. Îsraîl jî rasterast gef li desthilata Şamê xwarin.

Li ser şer û pevçûna pêkhateyên Durzî û desthilata Şamê, Meclisa Leşkerî ya Siweydayê di rêya daxwiyaneykê nivîskî de wiha gotin "Em dê bi hemû hêza xwe bersiva her cure dijminatiya ku di paşerojê de hebe bidin."

Herwiha Meclisa Leşkerî ya Siweyda ya girêdayî civaka Durzî ragihand ku ew dê destûrê nedin ti hêzên girêdayî desthilladara Şamê ku bikevin herêmên wan. Civaka Durziyan ya li parêzgeha Siwêda ya başûrê Sûriyê dixwaze di pêvajoya destûra nû de, mafên xwe yên olî û çandî bidest bixe, lê aloziya di navbera wan û desthildara Şamê ya nû de careke din veguherî pevçûnan.

Li ser mijarê Siyasetmedarê Durzî Semîr Ezam ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku armanca desthiladariya Şamê ji êrişan ew e ku komkujiyan di derheqê hemû pêkhateyên Sûriyê de pêk bîne.

### 'Şerê qirkirinê'



Siyasetmedar Semîr Ezam wiha axaftina xwe berdewam kir: "Tiştê ku li Sûriyê diqewime, mirov dikare şerê qirkirina pêkhateyên Elewiyan û Durziyan bi nav bike. Herwiha tê gotin ku desthildariya Şamê û komên girêdayî wê di dema dawî de qirkirina gelê Kurd jî tînin ziman. Ev tê wateya ku desthildariya Şamê ji bilî hişmendiya xwe, ti kesî qebûl neke. Ew bi navê Îslamê û li ser çend rêzên ku di Quranê de hatiye dayîn, van komkujiyan pêk tînin. Mixabin jî hejmarek şêxên Îslamê jî gihiştine vê baweriyê."

### `Yê ku hişmendiya van çeteyan bipejirîne, tune ne`

Semîr Ezam li ser birêxistinkirin Durziyan yên li Siwêdayê û deverên din wiha got; "Siweyda ne îro, wê ji sala 2013`an de xwe birêxistin kiriye. Ev tiştkî girîn û rastiyeke li ser rûyê erdê ye. Leşkerên Siwedayê ji bo parastina bajarê xwe û berjewendiyê gelê xwe, li hember Cebhet El-Nisra û DAIŞ`ê li ber xwe dan. Niha jî hêza me ya xweparastinê gelê me yê ku rastî êrişan tên, diparêzin û parastina bajarê xwe ew her tim amade nin. Lewra daxwaziyên me Durziyan ew e ku, em bi zimanê xwe bi ola û çanda xwe li Sûriyê bijîn. Lewra ev çeteyên ku dixwazin Sûriyeke nû bi hişmediya xwe ava bikin, wê ti carî ji aliyên pêkhateyan neyên pejrandin. Eger desthiladariya Şamê avakirina weletek nû dixwaze, divê destpêkê daxwazên me pêk bîne. Încex bi vî awayî Sûriyeke nû û azad were avakirin."

Ezam got, wê çareserkirin bi çeteyên mîna vê hişmendiyê re, tine be. Bê goman çareserkirina kirîza Sûriyê ne di destê gellê Sûriyê de ye. Lewra ev kirîz ji sala 2013`an de ji aliyê Îtalafa Sûriyê hatiye plan kirin. Herwiha Semîr Ezam got, divê destpêkê şerê navxweyî yên pêkhateyan olperestî were rawestandin.

### 'Bêdengiya dewletên navneteweyî şer gurtir dike'

Siyasetmedar Semîr Ezam axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo rawestandina komkuiyên (taifî) ku pêk tê ne tenê li Siweyda, Eşrefiyê û Sehnaya li tevahiya Sûriyê, me bang li dewletyên navneteweyî kir ku bi erkê xwe yê mirovî rabin. Tevî ku dewletên navneteweyî û rêxitinên derve hemû bûyerên ku diqewimin dibînin. Tevî ku beriya niha ji bo rawestandina komkujiyên li Sirbiya Kosofo û Indonîsiyê, çareserkirin. Lê heta niha ji bo komkujiyên ku li Sûriyê çêdibe, bê deng mane. Eger wiha bê deng bimînin wê şerê olperestî li Sûriyê kûrtir bibe û wê bi milyonan welatî jiyana xwe ji dest bidin."

2`ê Gulanê Şêxên Durzî yên Civata Misilmanên Miwehidîn û rûspiyên olî û şêniyên Durzî civînek li dar xist. Rêberê ruhanî yê Civata Misilmanên Miwehidîn Şêx Hikmet El Hicrî, şêx Yûsif El Cerbiû, Hemûd El Henawî, Hesen El Etreş, Yejya Amir, Akif Hinêdî, Wesîm Îzedîn û nûnerên komên çekdar ên xwecih beşdarî civînê bûn.

Piştî civînê daxuyaniyek hat dayîn. Di daxuyaniyê de diyar kirin ku ew parçebûn û cudabûna ji Sûriyeyê, her wiha radestkirina çekan bo desthilata Şamê red dikin.

Civîn bi van daxwazan bi dawî bû:

- Divê bilez hêzên ewlekariyê yên hundirîn û saziya edaletê werin aktîfkirin. Divê endamên wan ji şêniyên parêzgeha Siwêdayê bin.
- Divê bi lez dorpêça li ser Cеremana, Sehnaya û Eşrefiya were rakirin û jiyana asayî vegere.
- Parastina rêya Şam-Siwêdayê ji aliyê desthilata Şamê ve were mîsogerkirin.
- Divê li tevahiya Sûriyeyê şer were rawestandin.

# 'An Sûriyeke demokratîk an jî şerekî navxweyî yê bêdawî'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Rojnamevan Idrîs Henan diyar kir ku lidarxistina Konferansa Kurdî ji bo tevahî Sûriyê giring e û wiha got: "Lidarxistina konferansa yekrêziya Kurdî weke şertekî parastina yekrêziya ax û civaka Sûriyê ye. Îro jî bi yekrêziya xwe, bi rola xwe ya pêşengtiya dîrokî ya avakirina Sûriyeke azad û demokratîk radibe."**

Derbarê rewş û pêşeroja Sûriyê piştî konferansa yekîtî û yekrêziya kurdî, rojnamevan Idrîs Henan bersiva pirsên rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

### Yekîtiya kurdî wê heya kîjan astê bibe bingeha yekîtiya tevayî gelên Sûriyê?

Ji daxwazeke neteweyî û lukseke siyasî wêdetir, 26 Nîsana derbasbûyî, konferansa yekrêziya kurdî, weke hewceyeke dîrokî ya man û nemanê li Qamişloyê hate lidarxistin. Di heyameke wisa ku kirîza li Sûriyê bi desthilatdariya tundrew a HTŞ'ê re aloztir dibe de, nava rewşeke destwerdana çors ku rêya avabûna destpotîyeke çors a pala xwe dide qirkirin û tunekirinê, lidarxistina konferansa yekrêziya kurdî weke şertekî parastina yekrêziya ax û civaka sûriyê bû. Lewra jî; çawa ku kurdan ji destpêka aloziya li Sûriyê, bi helwest û sekna xwe ya xeta sêyemîn karîbûn pirrengî û demokrasiya Sûriyê bixin gerantiyê, îro jî bi yekrêziya xwe bi rola xwe ya pêşengiya dîrokî ya avakirina sûriyeyeke azad û demokratîk. Hişmendiya ku bi banga Rêber Apo ya aştî û civaka demokratîk re, di şexsê konferansa yekrêziya kurdî de, bi gewde bûye, careke din giringiya rola kurdan a parastina yekrêzî, azadî, demokrasî û pirrengiya sûriyeya nenavendî radixe ber çavan. Ji ber vê jî, ji kurdan pirtir, yekrêzî û helwesta kurdî wê rê li ber hemû cureyên destwerdanên derve jî bigre, hewceyeke bivênevê ya misogerkirina aramî, ewlehî û prensîbên jiyana hevbeş.

### Êrişên li ser elewî û durziyan, gefên li ser gelê kurd, dê pêşeroja sûriyê ber bi ku ve bibe?

Çawa ku konferansa yekrêziya kurdî mînakek baş ya girîngiya avakirina hevpeymaneke civakî ya nû ku hemû gelên sûriyê dihewîne nava xwe bû, her wiha hişyariyeke niştimanî bû ku gelên sûriyê bi desthilatdariya nû re rûbirûyî kiryar û sûcên şer ên dermirovî ye. Kurd jî weke pêşengên têkoşîna azadî û demokrasiyê, xwedî wê erka neteweyî ne ku li hemberî gef û gurên



terorê bi gelên sûriyê re di yek sengerê de li ber xwe bidin.

Têgihaştina bîrdozî û dîrokî ya kurdan ku çawa rasthatin û lihevketina berjewendiyên hegemoniya gilobal rê li ber komkujiyên HTŞ yên li dijî Elewiyên Beravê û Durziyan li Şam û Siwêdayê vekirin, pêşbîniya stratejîk weke avantaj pê daye qezencikirin. Her wiha ezmûna bi şerê li dijî terora DAIŞ û rejîma Baas re weke daneheveke berxwedanê kom bûye, têrê kiriye ku piştî 14 salan ji kuştin û hilweşînê ku têbigihêjin ku pirsgirêka li sûriyê meseleyeke qezenckirina nasnameya niştimanî ya tevayî gelên sûriyê ye. Ji ber vê jî, çendîn desthilatdariya HTŞ'ê hewl bide rûyê xwe biguhere, nikare xwe ji sûcên li dijîn komên etnîk û baweriyên sûriyê rû didin, biparêze. Dizane jî sûriyeya ku hemwelatiyên wê li ser nasnameyên etnîk û olî ve tê qetilkirin, wê sûriyeke bê nasname be.

### Sîstema herî baş ji bo pêşeroja sûriyê ku hemû pêkhateya biparêze çi ye?

Li gorî tabloya ku niha li sûriyê têye jiyîn, hemwextî bilindbûna asta metirsîdar a şerê mezhebî û etnîkî ku aloziya navbera pêkhateyên sûriyê de kûrtir û firehtir dike, ancax çareseriyeke demokratîk a bi koka xwe dispêre banga Rêber Apo ya aştî û civaka demokratîk; li vir em carek din mecbûr dibin ku girîngiya lidarxistina konferansa yekrêziya kurdî bi bîr bixin ku ew çawa tekane çareseriya demokratîk dihewîne.

Derveyî hişmendiyeke wisa, mirov nikare di derbarê pêşeroja Sûriyê de ti pêşbîniyan bike, Ji ber vê jî em carek din balê dikişînin ser girîngiya hevpeymaneke civakî ya nû ku xwe dispêre rêgezên azadî, demokrasî, wekhevî, pirrengî, nenavendî û azadiya jinê. Çendîn rêyên çareseriyê girtî bin jî, divê lêgerînên li çareseriya demokratîk, dûrî hêzên destwerdanê bi vîn û tampoyeke azad ranewestin. Bi gotinek din, an wê lihevhatinek niştimanî li ser bingehên jiyana hevbeş, pirrengî, pirçandî û rêveberiyeke nenavendî be ku hemû pêkhatiyên sûriyê dihewîne nava xwe, an jî wê parçebûn û berbelavbûna sûriyê û şerekî navxweyî yê bêdawî be.

FENER



## Hevkariya bi Rojava re misogeriya demokrasiyê ye

**Idrîs Henan**

Rejîma ketî ya Baas, ji bona ku desthilatdariya xwe mayînde bikira, pala xwe da rêbaza leşkerî ya şidet û zorê û tevayî daxwaz û xwestekên gelên Sûriyê yên demokrasiyê bi wê hewesa xwe ya destpotiyê re pênase kir. Ji bona wê jî Sûriyê veguherand qadeke vekirî ji destwerdanên derve re û roleke mezin û sereke di teqandina aloziya welêt de lîst. Ji lew re jî bi awayekî lezûbez, şer û pevçûnên qewimîne derbasî nava bajar, gund û cihên bi ewle yên sivlan kir. Bi vî awayî jî rewatiya xwe ji dest da û çi sazî û dezgehên ku bi rê ve dibirin jî bê wate û ne meşrû bûn.

Îroj piştî hilweşîna rejîma Baas, li paytexta Sûriyê Şamê HTŞ desthilatdariya xwe ava dike û li ser rêya Baasê jî destpotiyeke nû sazûman dike. HTŞ hewl dide bi hişmendiyeke tundrew a Selefî, li ser bingeha netewperestiya ku bi yek mezhebekî tundrew re bûye yek, otorîteya xwe li ser civakê tivî bike û bi piştgiriya hêzên faşîst diktator ên fena Tirkiyê hegemoniya xwe li herêm û cîhanê weke defakto raxe holê. Ji bona wê jî, berê xwe daye tesfiyekirina cudahiyên çandî yên Sûriyê û çawa ku bû desthilatdar, li dijî Elewiyan dest bi komkujiyan kir. Vê dawiyê jî Durzî xistin hedefa xwe û hewl dide bi tewanbariyên cuda cuda wan bê parastin bihêle ku derbeya qirkirinê li wan jî bide. Ji lew re, li gundewarên Şamê êrişî bajarokên weke Ceremane, Sehnaye û Eşrefiyêt Sehnaye kir û bi dehan Durzî qetil kirin, malên wan talan kirin û bi rêbazên rêbiran gef li pêkhateyên dîtir ên Sûriyê dixwe û Kurdan weke hedef nîşan dide. Gelo ev ne otorîteya netewperesiyeke hişk a çelûxwar ku bi eznavdiyeke mezhebî ya tundrew re homojenkirî be, mirov dikare çi navekî din lê bike?

Adara derbasbûyî, di navbera Fermandarê QSD birêz Mazlûm Ebdî û El Şara de hevpeymanek hate muhir kirin. Di encamê de, li gorî şopîner û lêkolînvanên navendên stratejîk li dunyayê, bi peymanê re hinek tetmînat ji raya giştî re hatin dayîn ku firsendekê bidin vê rejîma nû li Şamê ka wê guherînek çawa pêk bîne? Şam jî dizane, eger rewatiyek wê hebe dê bi rêya lihevkirinek ji dil bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê û hemû pêkhatiyên Sûriyê re be. Rêbazên HTŞ û DAIŞ ên komkujî û qirkirinê wê temenê wan ê desthilatdariyê kurt bike. Gotin, tekezî û helwestên navneteweyî ku li benda guherînên cidî û pratîkê ne, wê yekê diteyisînin. Ji lew re jî, her kes, şande û dewlet jê re dibêjin ku; pêwîste hûn hevkariya bi QSD'ê re xort bikin û divê hûn sûdê ji ezmûna Rêveberiya Xwesr werbigirin û bikin şirîkê birêvebirina welat.

Divê her kes û alî, di nav de HTŞ jî, bizanibe ku rola Kurdan û pêkhatiyên Sûriyê di avakirina Sûriyeya nû de, navendî û hewceyek dîrokî ya organîk e. Sûriyeya nû nikare bêyî ezmûna Kurdan û gelên Sûriyê bi gewde bibe. Heya vê kêliyê, yekrêziya axa Sûriyê bi vê hişmendiya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê re hatiye parastin, hişmendiya HTŞ parçe dike. lihevkirin û hevkariya bi hişmendiya demokratîk a Rêveberiya Xweser re wê rê li ber hemû rengên destwerdanan bigire, misogeriya yekîtî, azadî, aramî, edalet û wekheviyê ye.